MIJÛLANK



Miqdat
Dêrgijnîkî

Daristana mijîlankê te de
Her ji kevin de nêçîrvanekê
Dest helim hero li gel
Elenda spêda…
Bihost bihost
Qulaç qulaç zincîrên lêvên te
Yên sor di germ
Hişyar be çavên xwe
Ne zilqutîne wekî
Siyabendî ne ku di mijîlank û
Biriyê te de bikevim…
Di kûratiya derya çavên te de
Binav bibim dîn û har bibim
Qeraxê rû yên te yê
Nazik nekevim…
Her bihêle çavên xwe
Ne ziliqutîne esmanê
Hizrên min êt şêlî
şêlîtir lêneke
Bila her wekî sivora xwe bi
Mijîlankê te ve dadim
Xwe bilind kim…
Xwe ji stêra bilintir lê bikim
Li ser pişta heyvê bi xwe
Xaniyekê tecawiz çêbikim
Bihêle çavên xwe ne zilqutîne
Min ji bilindahiyê benerde
Li bin piya perçiqim mixabinî min
Çinku di hebûna xwe de aşiqê
Bilindiyan im lewra çûyme…
Gulpîtkên mijîlankên te û
Jor da derya çavên te yên şîn
Dinêrim keştên ahenga tê de bûn
Bo vedankên kesk û sor û zer
Li gel qolên kotirkên spî
Bo esmana bilind dibin…
Semaye şahî û govende
Bihêle çavên xwe ne zilqutîne
Roj roja me evîndara ye
Gav bo gavê ahenga
Berfireh dibiît sinorê
Çavên te hemiyê dê vegirit.